

KT
ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTÛ YA ZIMANÊN ZINDÎ YEN LI TIRKIYEYÊ
ŞAXA MEKAZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ
PROJEYA LÎSANS A BILIND A BÊTÊZ

FREKANS A TÎPÊ KURDÎ
DEVOKA NISÊBÎNÊDA (MÊRDÎN) WÊJEYA BIKARANÎNA
DENGAN

Îpek DERÎN
12721157

Şewirmend
Pwd. Hnk. MÎKAÎL BULBUL

Mêrdîn 2013

KURTE

Armanca vê xebatê tesbîtkirina rêjeya dengan ya devoka Serê Avê(Nisêbîn_MÊRDÎN) ye. Ji bo tespîtkirina dengan, çîrokên ku li wê herêmê tên vegotin hatine berhevkirin û ji wan hatiye îstîfade kirin. Piştî ku çîrok hatine qeydkirin û nivîsîn, ji dengê “a”yê heta dengê “z”yê rêjeya bikaranîna dengan hatine tespîtkirin û bi awayekî îqtatîstîkî hatine nişandayîn.

Di vê xebatê de tesbîta rêjeya dengên bikirp û bêkirp ku yê bikirp ji herfên “a,ç, e, h, k, r, p, t, x” pêk tînin, hatiye kirin. Her wiha tesbîta rêjeya dengên serê peyvan jî hatiye kirin û bi îstatîstîkan hatiye nişandayîn. Encamên rêjeya dengan ên van çîrokan, bi rêjeya giştî ya dengên kurmancî re hatine rûberkirin. Piştî rûberkirina rêjeya gûndê Serê Avê û rêjeya giştî ya dengên kurmancî, dengên ku rêjeya wan nêzî hev û dûrî hev hatine nirxandin û şîrovekirin.

Bêjeyên Sereke: Kurmancî, deng, bêkirp, bikirp, rêje

ÖZET

Bu çalışmanın amacı, Serê Avê(Nusaybin_MARDİN) ağzı seslerinin kullanım oranı ve sıklığının tespitidir. Tespitin yapılması için törede anlatılan masallar derlenmiş ve bunlardan istifade edilmiştir. Masallar kaydedildikten sonra yazıya geçirilmiş, “a” sesinden “z” sesine kadar seslerin kullanım oranı tespit edilmiş ve istatistiksel bir şekilde gösterilmiştir.

Bu çalışmada aksanlı “a, ç, e, h, k, r, p, t, x” ve aksansız seslerin oranı da tespit edilmiştir. Yine aynı şekilde seslerin kelime başında kullanılma oranları da tespit edilip istatistiksel olarak gösterilmiştir. Bu masallardaki ses oranlarının sonuçları Kürtçe(kurmanci lehçesi)’nin genel ses oranıyla karşılaştırılmıştır. Serê Avê köyünün ses oranları ile Kurmanci’nin genel ses oranlarının karşılaştırılmasının ardından, oranları birbirine yakın olan seslerle uzak olan sesler değerlendirilmiş ve yorumlanmıştır.

Anahtar Sözcükler: Kurmancî, ses, aksanlı, aksansız, oran

NAVEROK

KURTE	I
ÖZET	II
NAVEROK	III
LÎSTEYA TABLOYAN	V
LÎSTEYA GRAFÎKA	VI
PÊŞGOTÎN	VII
KURTEBÊJE	VIII
DESTPÊK	1

BEŞA YEKEM

1. METNÊN XEBATÊ	3
1.1. <u>Teyrê Şîreta</u>	3
1.2. <u>Keçeloneko</u>	9
1.3. <u>Bizin û Gur</u>	14
1.4. <u>Zênka Zêra</u>	15

BEŞA DUYEM

2. TESBÎTKİRÎNA HEJMAR Ê RÊJEYA TÎPÊN BİKIRP Ê BÊKIRP	
YA GIŞTÎ	16
2.1. <u>Tabloya Giştî</u>	16
2.2. <u>Grafîka Alfabetîk</u>	17
2.3. <u>Grafîka Giştî L1 Gorî Rêze</u>	18
2.4. <u>Grafîka Tîpên BıkırP – 1</u>	19
2.5. <u>Grafîka Tîpên Bêkırp-2</u>	19
2.6. <u>Grafîka Tîpên Bıkırp – Bêkırp 1</u>	20
2.7. <u>Grafîka Tîpên Bıkırp – Bêkırp 2</u>	20
2.8. <u>Grafîka Tîpên Bıdeng-Bêdeng Ya Vê Xebatê</u>	21
2.9. <u>Nirxandina Giştî</u>	22

BEŞA SÊYEM

3. HEVBERÎ KİRİN A VÊ XEBATÊ JÎ XEBATÊN DIN RE (XEBATA CELADET BEDİR-XAN Ê BARAN RIZGAR RE)	23
3.1. Grafîka Hejmara Xebata Celadet Bedîrxan	23
3.2. Grafîka Tîpan Ya Li Gorî Rêzkırına Jisedîtîyê Ya Xebata Celadet Bedîrxan	24
3.3. Grafîka Tîpan Ya Li Gorî Rêzkırına Jisedîtîyê Ya Xebata Baran Rızgar	25
3.4. Tabloya Hevberîkırına Her Sê Xebata	26
3.5. Tabloya Hevberî Kırına Tîpên Bıkırp – Bêkırp Avê Xebatê Ê Xebata Baran Rızgar	27
3.6. Nırxandina Hevberî Kırın A Her Sê Xebat	27
	29
ENCAM	30
ÇAVKANÎ	32
PÊVEK	33

LÎSTEYA TABLOYAN

- Tablo 1:** Tabloya Giştî Ya Bikaranîna Tîpan
- Tablo 2:** Danberhev Kirina Hejmar û Rêjeya Tîpên Her Sê Xebata
- Tablo 3:** Hevberî Kirina Hejmar û Rêjeya Tîpên Du Nuans Yê Vê Xebatê
û Ya Baran Rizgar

LÎSTEYA GRAFÎKAN

- Grafîk1:** Grafîka Hejmar û Jisedîtiya Tîpan Ya Alfabetîk Ya Vê Xebatê
- Grafîk 2:** Grafîka Li Gorî Bikaranînê Rêz Kirina Hejmar û Jisedîtiya Tîpan.
Ya Vê Xebatê
- Grafîk 3:** Grafîka Rêjeya Tîpên Bikirp Ya Giştî Ya Vê Xebatê.1
- Grafîk 4:** Grafîka Rêjeya Tîpên Bêkirp Ya Giştî Ya Vê Xebatê.2
- Grafîk 5:** Grafîka Rêjeya Tîpên Bikirp û Bêkirp Ya Giştî Ya Vê Xebatê.1
- Grafîk 6:** Grafîka Rêjeya Tîpên Bikirp û Bêkirp Ya Giştî Ya Vê Xebatê.2
- Grafîk 7:** Grafîka Rêjeya Tîpên Dengdêr û Dengdar Ya Giştî Ya Vê Xebatê
- Grafîk 8:** Hejmar û Rêjeya Tîpan A Giştî Ya Xebata Baran Rizga Baran
Rizgar, Uygulamalı Kürtçe Derslerî/Dersên Kurdî, Lithosphere
Printing Cooperative, 1993, R.392

PÊŞGOTIN

Armanca vê xebatê tesbîtkirina rêjeya dengên herêma Mêrdîn (Nisêbîn-Serê Avê) e. Ji bo vê xebatê ji gundê Mêrdîn(Nisêbîn-Serê Avê) ê çîrok hatine qeydkirin û nivîsîn. Piştî ku çîrok hatine qeydkirin û nivîsîn, ji dengê “a”yê heta dengê “z”yê rêjeya bikaranîna dengên hatine tespîtkirin û bi awayekî îqtatîstîkî hatine nişandayîn. Encamên rêjeya dengên van çîrokan, bi rêjeya giştî ya dengên kurmancî re hatine rûberkirin. Di rûberkirina rêjeya dengên kurmancî yê giştî de, ji du xebatan hatiye îstîfade kirin. Xebata yekem a Emîr Celadet Bedirxan û Roger Lescot ye ku di berhema bi navê “Kürtçe Dilbilgisi (Kurmanci)” de cih girtiye. Xebata duyem jî ya Baran Rizgar ya bi navê “Kürtçe Dersleri / Dersên Kurdî” ye.

Weke ku tê zanîn, xebatên qadî di warê fonetîk û rîzimana kurmancî de pir kêmtir in. Girîngiya vê xebatê ew e ku bi qasî ku em zanin, berî niha tu kesî ji aliya tesbîtkirina rêjeya dengên herêma Wanê(Erdîş) tu xebat nekiriye.

Di vê xebatê de tesbîta rêjeya dengên bikirp û bêkirp ku yê bikirp ji herfên “a, ç, e, h, k, r, p, t, x” pêk tên, hatiye kirin. Her wiha tesbîta rêjeya dengên serê peyvan jî hatiye kirin û bi îstatîstîkan hatiye nîşandayîn. Encamên rêjeya dengên van çîrokan, bi rêjeya giştî ya dengên kurmancî re hatine rûberkirin. Piştî rûberkirina rêjeya herêma Wanê û rêjeya giştî ya dengên kurmancî, dengên ku rêjeya wan nêzî hev û dûrî hev hatine nirxandin û şîrovekirin.

Ev çîrok di sala 2013an de hatine berhev kirin. Vebêjerên van çîrokan du kesin ku yê di destpêkê de werin danasîn. Tu guherîn ji ser çîrokan nehatiye kirin û çawa hatiye gotin wisa hatine nivîsîn. Di vê xebatê de ji şeş çîrokan îstîfade hatiye kirin ku di wan de 5192 bêje û 18988 tîp hatine bikaranîn. Tîpên bikirp bi riya xêzkirina binê wan hatine nîşandan.

Tez, ji destpêkê, du beş û encamê pêk tê. Di destpêkê di derheqê xebatê de agahiyên giştî hatine dayîn. Di beşa yekem de metna çîrokan bi awayekî ku binê tîpên bikirp xêzî, hatine dayîn. Di beşa duyem de îstatîstîkên rêjeya bikaranîna dengên çîrokan giştî, bi rêjeya giştî ya dengên kurmancî re hatine

Ji bo şewirmendî û alîkariya mamoste Mikail BULBUL gelekî spasîyê dikim. Her wiha ji bo alîkariyên wan yê asta berhevkirina çîroka re keçxaltîk a min Latîfe AXIRMAN re û kesên çîrokbêj Remziya AXIRMAN, Atiye AXIRMAN re spasdar im. Ji bo alîkariyên jiyane de her tim li cem minin diya min Şemsa û bavê min Nihat

DERÎN ra sipas dikim.Û her dem hevalê hêja Işilay KARA û Ridvan YAŞAR re sipasdarim.

Mêrdîn 2013

KURTEBÊJE

bnr. : binhêrin

hwd. : her wekî din

tev. : tevahî

t : tablo

g : grafîk

r : rûpel

d : dûyem

ç : çîrok

DESTPÊK

Mebest ji vê xebatê ji van çîrokan de tesbît kirina freqansa tîpan e. Hejmar û rêjeya tîpa hatiye tesbît kirin û encamên xebatên din re hatina rûberkirin. gewera her dengî tîpek e. Lê belê hine deng hene nîşandana wan yan jî kesê biyanî re vegotina wan gelek dijwar e. Bi taybetî jî tîpên P,Ç,T,K bi vê rewşê danin. Ev tîp her çiqas tîpên hişk bin jî hine peyvan de asta hişkbûna wan dikeve û bi awayekî bikirp têne xwendin lê nivîsa wan yek e. Ev bûyera denga rengedeng e. Wek mînak mirov dikare bêje ku peyvên pez, çerm,teng, kevir dema aliyê yekî biyanî ve werin xwendin dengê P,Ç,T,K yê awayekî bêkirp werine xwendin û ev dengên wek tirkî werin bilêvkirin. Lê yekî kurd dema van peyva dixwîne asta hişkbûna wan kêma dike û awayekî bikirp dixwîne. Lê belê ew rewşa ku kurd dixwînin gerewa wan denga elfabê de tune. Dema mirov dêna xwe bide peyva ‘kanî’ du peyvên hevdeng bi vî awayî tîpên nivîsîn. Yek ew tişte ku av lê dikişe ya din jî pîrsa ‘li kuye?’ kesên ku kurdî nezan bin van herd peyva wek hev dixwînin çima ku nivîsa wan yek e firqa wan dema ku aliyê kurdekî ve tîpên xwendin bilêvkirinê de dertê holê. Dema ev tîp awayê bêkirp werine bikaranîn wê demê pîrsgirêk tine tîp tam jî gerewê deng e. Wek mînak peyvên pol, çar, tax, kurd bi aliyê herkesî wek hev tîpên xwendin.

Armanca vê xebatê tesbît kirin a van dengên du nuans e. Hejmar û rêjeya wan û encamên danberhev kirinê ji xebatê din re hatiye dîyar kirin. Vê xebatê de li ser tîpên bikirp-bêkirp (P,Ç,T,K,A,E,H,X) hatiye sekinîn xêynî van du tîpên dinê(R) jî hine ku him bi awayê asayî tîpên xwendin him jî bi derbandineke xurt tîpên xwendin. Tespît kirin û lêkolîn van jî hatine kirin. Her deh tîp jî metnan de bi awayê asayî hatine nivîsin, awayê wan yê bikirp de binê wan hatine xêz kirin bi vi şiklî hatine dîyar kirin. Di van dangan de P,Ç,T û K kê de rengedeg heye. Binê awayê wanê bikirp hatiye xêz kirin. Mînak: paşa-pîşt, çar-çem, tehran-tîşt, kêlek-kevir, agir-aciz, eşkere-evdal, hesp-heso,xatir-axa,gil û gemar-çêlek, birîn(navdêr)-birîn(lêker)

Ji van deh dangan A(ayn-ع), E(eyn-ع), H(he-ح) û X(ğeyn-خ) dengên erebî ne û xebatê de binê wan hatine xêz kirin û ev deng hine peyvên kurdî yê resen de jî cî digrin wek mînak peyva çe’v çîroka de derbas dibe. “R” jî awayê wanê bi derbandin dertên hatine xêz kirin. “R” ya biderbandin nav dev de dilerize û wek şedde ya erebkî û

girover dertê. Binê vê rewşa van tîpan jî hatiye xêz kirin. Serê peyvan de “R” her tim girover dertê .

Ev xebat li ser 4 çîrokan, 5192 peyvan, 8731 tîpên bideng, 10257 tîpên bédeng, ji tevahî 18988 tîpan hatiye kirin. Tabloya elfabeyê, tablo û grafîkên tîpan yê giştî û yên bikirp û bêkirpan hatine derxistin. Li gorî bikaranînê rêza wan hatiye çêkirin encam hatiye nirxandin û xebatên bi vî karî re ya Mîr Celadet Elî Bedir-Xan û ya Baran Rizgar re hatiye danberhev kirin. Hêmanên wek hev û yê cûda ber bi çav dikevin ev giredayê herêma û jîndarbûna ziman e. Her wiha dîsa tesbîta hejmar û rêjeya tîpan ya serê bêjeyan hatiye dîyar kirin û xebata Celadet Bedirxan re hatiye rûberkirin. Baran Rizgar xebata xwe de ev nekiriye. Ê dîsa hejmar û rêjeya tîpên bideng û bédeng jî hatiye dîyar kirin.

Vê xebata qadî de metna ku bûye mijara lêkolînê di şeş çîrokan pêk tê herêma berhevkirinê Serê Avê(gundê Nisebîn) ye. Ev çar çîrok ji aliyê du çîrokbêjan hatine vegotin. Lêbelê sernavên çîrokan aliyê çîrokbêjan ve nehatiye dîyar kirin dema xebatê de ji bo hêsaniyê hatine danîn. Çîrok ser hev bi 40 deqîqeyan pêk tên. Çîroka yekem ya ku bi navê “Keçelonek, Bizin û Gur, Zênka Zêra” hatiye binav kirin 20 deqîqe ye. Vebêjerê vê çîrokê Atiye AXIRMAN e. Ew bi eslê xwe ji gundê Midyad ê ye. Wexta kû zewiciye hatiye Serê Avê. 38 sal emrê wî heye. Wî ev çîroka salên ku hatiye gundê Serê Avê ji xwesûwa xwe elimiye. Vebêjer tu perwerde nedîtiye. Çîrok serê gulana 2013an de hatiye tomar kirin. Çîroka dawiyê ya bi navê “Teyrê Şîreta” jî aliyê Remziya AXIRMAN hatiye vegotin û wî ev çîrok jî heman gundî de ji cem heman kesî hîn bûye û tomara vê Çîrokê jî heman dîrokê de hatiye çêkirin û çîrok 20 deqîqe ye. Vebêjer gundê Qesirkê (Nisebîn)ye. Ew 50 salî ye û ev çîroka piçûktaya xwe ji cem dayika xwe gelek cara guhdar kiriye. Çîroka wî 20 deqîqeyan pêk tê . Bûka xalê diya min e . Ew jî tû perwerde nedîtiye. Çîrok gulana 2013an de hatiye tomar kirin û xêncî kurmanciyê tu zimanî nizanin.

BEŞA YEKEM

1. METNÊN XEBATÊ

1.1. Teyrê Şîreta

Go car_kê zilamek hebû go, ezê herim hecê. Go kiribû herê hecê rabû go te pîreka xwe (Ti carê jî pîreka wi derneketa derva) got yê:

_Ez ê çima sükê. Tiştê kû ji pîreka mi ra lazima ji bonî xatîrê go ez herim hecê werim tiştê ku jê re lazim bê ez jê ra bînim dernekevê.

Rabû çu sükê tişt û mişt kirîn, rabû meyizand carekê teyrêkî xevkê hinadaya wê dibêjê:

_Hêê teyrê firotinê, teyrê şîreta

Kurik dibê vî teyrî pîreka xwe ra kirim. Go ez herima hecê ji bona xatîrê go şîreta pîreka mi bikê. Anî, danî ser qatirkî bir. Cîhkê wê li hewa çêkir û ser rîya hecê ket gotyê go:

_Mezêna, hermet xwarina vî teyrê hana kê her sê danê wî lazima ti goşt û birincê bidyê da. Eleqê te jê nîna û çî bîjê mezêna be ma ê çî bîjê.

Go rabû mîrik çu hecê . Go çu hecê carê diçê derdikevê keviya balkonê, kurê mîrê wî bajarî (gihaye zewacê û hê jin neaniye) devê dêriya wa diçê dimeyzênê wîlo jînekî gelekî sipehiya. Dirabê wextana ku kurê mîr çav lê dikê ne go hingî sipehî bû ne bi dilekî bi heft dila dilketi yê .Wêca ez ê çî kim .Vedigerhê, diçê dibê ez ê çilo wê pîrekê bînim û ez ê bejim.(kurê mîr) gihaye zewacê hê jin neecibandiya. Diçê çil pîrekê cambaz tîne. Yek ,yek zora her sih û neh ê dî dibê. Dibêjê zanê; dibê çiya:

_Pîrekîk vê xaniyê hana diya, lazima wê pîrekê ji mi ra eyarkê. Jînekî zahf sipehiya.

_(Jinîk dimeyzênê diçê wir dibê) Wîî ew hêsansane!

Jinîka cambaz diçê cem jinîka kû merê wê çûya hecê. Diçê wê de dibêjê filankesê:

_Xwedê kurê min dawa yekê dikê. Dibê yekê mi ra bîna û em va nêzîkê hevdu na ez dixwazim go ti mi ra werê em herin yeka kurê xwe bixwazin. Gora go derkevê derva.

Dirabê derdikevê derva ,Diçê cilê xwe li xwe dikê, xwe didilênê xwe xweşik dikê go derkevê derva teyr dibakê ,dibêjê:

_Tê çî kê xanima min?

_Wala ev pîrek hatiya, go dibê wera yekê ji kurê mi ra em ê bixwazin.

_Dibê ka wera ez ê xeberekî ji te ra bêjim. Teyr dibakê pîreka xwediyê malê.
Divedigerihê dibêjê :

_ Xanima min ti zanê çî ya?

_Dibêje erê.

_Dibê;

Keçik û kurikik hebû keçam û kuramê hevdû bûn û gelekî hij hevdû dikirin.
Dibê ahlê wana kê keçikê nadina kurik. Kurik jî wê direvênê, dibê ber behrekê.
Dimeyzênin gemiye tê. Xwediyê gemiye çav keçikê dikê dibêjê kurik:

_Wala gemiya min xerabûya. Ez nikarim we herdoka bibim, ez ê yekî jî we bibim.

Kurik jî dibê rabim ez herim û ez dergistiya xwa bihêlim hawar li pey me ya ew ê ji pey mi veqetênin û ez wî bişênim dirabê wî dişênê. Çara wî ew dimenê. Keçama xwe dişênê. Suwar dikê yanê wê xwediyê qayikê dîsa lê vegerê. Nema lê divegerê. Keçikê dibê û behrê va diçê. Keçikê direvênê û dibê.

Teyr vena jî xwediyê malêra dibêjê. Pîrekê ra dibêjê. Xwediyê malê ji pîrê ra dibêje:

_ Wala heyra îro hera îşê min derketiya îro hera sibahî wera, ez îro nayem îşê mi heya. Teyr wê wûlo disekinênê, şîreta lê dikê.

Pîrê wê rojê diçê. Dibêjê kurik:

_ Ha wala mi qaniş kir hata devê dêrî, işeki wê derket û dîsa vegereha. Dibê tamam hey rojkê ê dakevê.

Dirabê derdikevê roja dî pîrê diçê dibê

_ Cîranê wala ez dixwazim ti mi ra werê kurê mi dawa yekî dikê. Yeka xwe dîtîya dixwazim ti mi ra werê.

_(Dibê) Ser sera ser çava.

Carekî dî diçê xwe kar dikê. Go herê. Dîsa teyr dibakê:

_ (Dibê) Xanima min ma tê çê. Tel halê wê keçikê û kurikî ne pirsî. Dibê de kanî bêja :

_Disa dimeyzênê dibê ew kurik ew vegereha, kuramê wana dinyayê va diçin.
Xwediyê gemiye keçikê behrê va dibê. Diçê dimeyzênê li kevîya bejekê sîngê gemiya xwe diçikênê. Gava kerîk pez li wir e. Digêhênê wê derê dibêjê

_Wala ez birçî bû ma. Beriya wê na deverekê keçikê dielimênê. qederekê keçikê dielimênê. Dirabê carê dibê nîvê behrekî û dibê hê xwediyê gemiye:

_ Ez ê ajom û ti raza.

Kurik dirazê, Dibê hû keçik dehfeke lê dixê wê tavêjê bejekê û diçê. Keçik behrê va diçê. Dibê hey ez û kuramê xwe qût bûn, kurik tavêjê bejekê û devjê diqerê û diçê. Diçê diçê diçê dimêyzênê deverkê pezin ber behrêya, li ser avêya. Dirabê diçê disekinênê gemiya xwe disekinênê diçê ba wî şivanî dibê:

_Wala ez birçî ma.

Wextana ku şivan çav keçikê dikê gelekî hij jê dikê. Dibê

_Ser çava.

Şîr jêra didoşê, nên tênê didiyê da keçik dibê:

_Kirivê herim

Şivan dibêjê:

_ Wala ez nahêlim ti herê.

Dibê:

_Çilo ti nahêlê

Dibê:

_Vala ez nahêlim. Ez ê te ji xwe ra bibim.

Dibê:

_ Tamam. Ser sera ser çava. De herâ, diva bê ti herê dawatekê bênê yanî xêlî werê ma ez wilo nadima pey ta nayimê malê diva bê dawatekê bênê. Ez ê li vedê hazir li hevya te bim. Şivan jî şivanê golika ya. Diçê gûnd dibê wala mi yeqa xwe di^{ti}ya dixwazim go hûn werin. Ez ê wê ji xwe ra ênim. Heta gûndiya didê hevdû tê, Keçik gemiya xwe suwar dibê diçê. Keçik li hêviya wî naminê. Şivên gava tê pez jî kê, gur ketiya nav pêz pez jî xwariya. Gundi jî pey şivên dikevin ew jî baz didê. Keçik jî kê wûlo diçê. Disa xwediyê malê dibêjê pîra sahrbaz dibê:

_Herâ ez ê roka di ez ê êm.

Pîrê diçê dibê kurê axê dibê:

_Zanê mi qani^x kir ha^{ta} devê dêrî û ji devê dêrî disa vegereha.

Dibê:

_Xem nîna pîrê îro nebû roka di.

Disa roja di pîrê diçê dibê:

_Keçam wala kurê mi têra mi li mi xist. Ez kuştim. Dixwazim ku ti mi ra werê.

Dibê:

_Ser sera ser çava. Tiştêkî ne gelek girînga.

Disa derdikevê. Diçê xwe di^{edil}ênê, xwe xweşik dikê go pîrê ra herê. Teyr dibakê:

_Xanima min tē çî kê?

_(Dibê)Wala ez ê vê pîrê ra çim.

_(Dibê) Ka wera du xeberê min hena ez ê ji ter bêjim û disa heya. Disa jini^l lê dihesênê teyr dibê:

_Xanima min te halê wê keçik û kurik nepirsî. Dibe de ka bêja:

_(Dibê) Zanê ew keçik diçê bajarekî. Dimeyzênê gava wî delîlî ketîne nav bajêr û ji xwera digêrihin, dibên:

_ Îro mezinê vî bajarî gotiya ez ê çil keçikê ênim û her çilî ra ez ê bizewicim. Keçik dana hevdû û keçika digerin. Laqayê wê dibin. Milê wê digrin wê jî dibin. Çil keçika. Her çilî dibê wê îşev pê bizewice. Go halo diçê dimeyzênê wan dibine hûndûrkî. Dibê:

_Hûnê çî kin

Dibê:

_ Wala her çil pîreka wî zilamiya. Wê bi her çilî ra îşev bizewice.

Dibê:

_Wala em qiyma xwe wûlo naynin. Wexta ku mazinê vî bajarîya halo qiyma me nayê. Lazima dawatekê çenekê, ne bê ber behrekê û kêf û seyranê nekê em qiyma xwe naynin.

Dibê waxtano ku wûlo dibê, dibê tamam. Dirabê diçin ber behrekê. Nêzikê gemiyê dibin, wêdê dawate dikin. Ew jî carekî dibakê her çil keçikê hevalê xwe dibê:

_Ka em bikevin gemiyê da em ê xwe biêdilênin.

Hemû dikevin dibê hii sîngê gemiyê dibê û behrê da tajo yê. Behrêda tajoyê û dibê. Dibê hin eşqiya hene, bîst zencir kirina behrê, avakî mezina. Bîst xistîna vî alî, bîst xistîna wî alî. Gemiya ku verê wan diçelîhênin. Wa zamt dikin, gemiyê disekinênin. Dêrî vedikin, yeka ku derdikevê ji xwer dibin yek, yek yek, heya her çil derket ew ma paşi. Wextana go ew derket vêca her çil ser wêna pev çû. Dirabê her çil ser wê keçikê pev diçin, xweşik bû. Piştî go pev diçin dibê:

_ Halo çê nabê. Dibê ez ê hungiliska xwe bavêjim binê behrê. Go kê jî we girt, her çilî kê jî we girt ez ya wî ma.

Dirabê wextana ku hungilîska xwe tavêjê her çil xwe bi hev re dibê xuppp xwe tavêjin nav behrê. Go hungilîska wî derxin ew ya wa ya. Dibêjê keçikê hevalê xwe:

_Cilê wa li xwe kin.

Cilê wan li xwe di_{kin}. Hespê wa jî li wire. Hespê wa suwar dibin lê dixin diçin. Heta ku her çil zilam serê xwe ji behrê derdixin dimeyzênin gava ne keçik, ne cilê waa ne hespê wa ti tiştî wa nîna. Dibê:

_ Lawo derkevin ti tiştî nemaya. Em tazî mana

Dirabê keçik cilê wan li xwe di_{kin} û hespê wan suwar dibin û diçin bajarekî. Diçin dimeyzênin ew bajar heziniya. Dibê:

_Çima ev bajar heziniya?

Dibê:

_ Axa yê vî bajarî miriya ji bona wûlo. Dibê wê bakin gel, teyrek heye teyrê baz. Teyrê zana ser serê xelkê berdin. Bê ser serê kê denê ew bê walî ya wî bajarî ya. Xelk hemû hatin cem hev û keçik jî li wir sekiniya. Teyr diberdin. Çiqas teyr diberdin her car teyr diçê ser serê wê keçikê denê. Dibê:

_ Ev teyrê ma şaş bûya. Çima ser serê vî keçikê denê. Çi qa diberdin dibên wala sê cara me ber da û ser serê wê dani. Dibê ewe.

Di_{kin} a walî yê wê bajarî. Ew jî dibêjê:

_ Hespê ma bibin xanê. Bera êmê wa bidina wa û ew jî loqantakî çê dikê.

_Sûretê xwa û her çil keçikê didaliqênê. Dibêjê xwediyê loqantê dibêjê

_Mezênêna zilamê ku werê li vî sûretê meyzênê û keserek bi dê lazima ti wî zilamî bigrê û werênê bidê min. Dirabê keçik dibêjê û diçê. Ew a ku kuram û keçamê hevdûna. Herdoka hevdû revandina. Pêşî qey kuramê wî tê. Dimeyzênê sûretê wê dalqandiya. Wûlo dimeyzênê keserek diberdê. Xwediyê loqantê dibinê. Milê wî digrê dibê cem walî. Walî lê dimeyzênê zanê ku kuramê wî ya dibê:

_Herin bibin deverekê xweş û qedrê wî bigrin. Xwarina xweş bidin û qedre wî bigrin.

Qederek pêva naçê xwediyê gemiyê tê. Ew jî te wir. Ew jî wê sûretê dibinê, ew jî wûlo keserek diberdê. Weka xeyalak tê bîra wî. Ew jî dibin dibê:

_Wê bibine deverêki nan û av bidin deqena nemrê. Lê cihê wî nexweş bê. Hema nemrê besa.

Peyda ew zilamê go digo çil keçikê ez ê bihevdû ra ênim wî digrin. Dibê:

_Wî jî bixin deverêkê da nanê go nêmrê bidin besa.

Peyra her çilê bihev ra tê . Ew jî dibin ba walî. .Wa ifada dikê. Dibêjê wanakê dibê:

_ Bêjin. Çima hûn hatin. We li wa sûreta meyzand û wûlo keserek berdan. Dêrdê wa çiya lazima hûn rastî bêjin. Hûn rastî nebêjin ez ê serê we jêkim. Dibê walahi:

_Em eşqiya bûn. Em ketîbûna behrê da. Me her çil girtîbûn. Yekê heneke xwe bi me kir. Go hungiliska xwe avêt avê go lazima hûn derxin. Ki ji we derxê ez ya wi ma. Em pev çûbûn ser. Rabû heşa em derketin cil ji çû ya. Ê hespê me ji çû û halo.

_Dibê hûn derê ha bin. Dibakê ê di. Ê go digo ez ê çil keçikê bihevr bênim. Dibakê wi. Ew ji dibê:

_Walah mi ji mi gotîbû ez ê çil keçikê lazima di şevekê da bênim û ha min xapand. Em çûne ber behrekê go lazima dawatê çê be. Me dawatê kir û ew ji ketin gemiyekê û çûn. Nizanim be bi kû da çûn. Dibeje:

_ Tamam ti ji dera ha rûna. Dibakê ê şivan. Go te go çima te li vê sûreta ha nêri û ew keser berda.?

_Go xwedê keçikê bû. Hate cem min û got ez birçî ma. Mi şîr dayê, nan dayê. Mi go ez ê te ji xwe ra bibim go tamam û heşa ez çûm. Mi go heşa dawate ji gûndê xwe bênim . Ez hatim wî çû ya û deyî gur jî ketiya nav pez û golikan. Ew jî ê gundiyan bû. Gundi ji tamam ketin pey mi. Gur pez hemû xwaribû e ji kê dinya yê ketim.

_Go tamam. Ti ji li dera ha rûna. Bakira ê gemi yê. Ê go keçik revandi bû. Keçik jî kuramê wî şîrandîbû, biribû. Bakire wê. Wî jî go:

Hal û mesala min ev e. Keçikê û kurikê hevdû revandi bûn û anî. Wexta go min çav li keçikê kir ez dil ketimê. Mi jî mi derûwa go mi go gemiya mi xera bû ya . Ji bona xatirê ez keçikê bibim mi go gemiya mi xera bû ya ez we herdoka nikarim bibim. Mi yekê ji wa bir. Mi keçikê bir û ez hew li kurikê vegeham.

_Go ti jî li dera ha rûna. Dibakê -kuramê xwe go rastî bêja çima te li wa sûreta meyzand û ew keser ser berda. Go

Wala me keçamê û kuramê hevdû bûn. Xwedê amê mi nedida mi. Mi jî rabû revand. Em çûna ber behrekê gemikê hat. Go digo çav lê kir. Bê ka fişna go wala gemiya mi xera bû ya lazima ez ê yekê ji we bibim. Mi jî mi go ez herim dergistiya xwe li vir bihêlim gûndi li pey me na. Wê ji pey mi vegehenin û ez wê bişênim û mi wê şand. Xwediyê gemiyê keçama mi bir hew li mi vegeha. Ji bona wûlo ew keser berda. Go:

_Ti ji dera ha rûna. Rabû got kuramê xwe gotiyê serê we ya ha jêka. Ê xwediyê gemiyê, keçama te biriya. Gotê hespa jî go cil û hespê w ali xanê na. Ew ji dana wa. Rabû keçikê û kurikê ji gihan hevdû. Kurikê ji dewsa xwe dikê wali û çirokê ma xelas.

Teyr her roj hinêki ji vê çirokekê gotê û heşa zilam ji hecê ha nehiş go derkevê derva û ew ji bi hevdûra jiyanêki xweş derbas kirin. Hûn saxê û em bi silamet.

1.2. Keçeloneko

Hebû nebû rehmel dê û bavê min û wa.

Zilamek hebû, zilamkî hafiz. Zilamkî hafiz bû, gur şivanê wi bû. Go her şev gur pêz bênê malê. Go rabû her roj ji kê eyara hûrî wîna zerikek şîr bû. Go firdik diçan, dixwar. Go wêca rokê halo firdikê xwe çandiya go gêncek ji hatiya pêr xwariya. Te dî em dibêjin korra hafiza nabînê. Go rabû xwe zemitand, êdî gênc pêr dixwar wî nizani bû kor bû nedidît. Go rabû hinga go zerika xwe xelas kir go xwe zemitand go wala mi têt nexwar. Çi kûla mi bû îro. Go rabû zerikik di firdik çê kir û xwar. Go wala xwe zemitand û tirik kir.

_(Go) Wala mêrik go jê tirate me, wî genci.

_Wala heyra ti ne ji tira mini

_(Go) wala bêlê ez jî tira te me. Ez jî te ma.

_(Go) Hêdi ez ê herim serê bên ez ê mîz kim hek mîza mi li te ket wala ti ji min î. Heka mîza mi li te neket ti ne ji min î. Go rabû ê hafiz çû serê bên mîz kir. Go kurik çû laşê xwe sûravk kir û hat. Go daket mîz kir. Hat go halo zimanê xwe li mi xa. Va ez şorim ji te ma. Go rabû zimanê xwe lê xist go tamam ti ji min î.

_(Go) De ka em bûn bav û kurê hevdû, em ê çî îşî ji hevdûr bikin. Kurik go:

_Yabo!

_(Go) hê.

_(Go) ev gura ha aminê pê nabê. Ti hero dişênê ber pêz. Ez ê herim ber pêz ma qey ê gur herê ber. Go wala rabû hafiz go:

_ Heyra, lawo gur diçê ber û têt. Ma ti yê mala xwe ya ti neça ber. Go wala zora bavê xwe bir çû ber pez. Go di roj sê roj çû,:

_(Go) Wala yabo ez hew diçim ber pez. Ez ê rabim herim. Dinyayê wa herim.

_(Go) Qey lawo?

_(Go) Wala nema sebra mi ber wî pezî têt.

Go rabû kurik kirîbû herê bavê wî hungiliskik dayê. Go hungiliskik dayê, go di go lawo wê hungûliskê halo bizivîrê safa wê na ê hespkî bayî ê li ber te bisekinê. Hinga ti ketî tengayê da ê li ber te hazir bé. Û hinga wekî dî be ti bizivîrênê ê hespkî Kurmancî ê li ber te bisekinê. Go rabû kurik çû, kurik jî hingî sipehî bû. Go kurik xweşik bû çû giha şivanekî go:

_Ho şivano! Go

_Hêê. Go ê hafiz ji peren da bûn. Zêr dabû. Gotî bû lawo ti herê kû dê te ji xwe ra mesref bikê. Çû giha şivan go:

_Kanî bizinkê bûgrêna û eyara wî bide mi û bera goştê wî jî ji ter be û ez ê zêrkê jî bidim te.

_(Go) Na heyra na. Ê gûndi ya ez nikarim bidim.

_Serê te ez ê bidim. Go rabû zora wî bir û gurand. Ew eyarkê wê sawalkê li milê xwe kir û çû. Çû giha mala axakî, go wala axakî wala axê go

_Ma ti çi kesî?

_(Go) Wala ez yekî feqîrim, ez hatîma îş. Axê got

_Ma bi kêrê êzinga tê?

_(Go)Wala ê lingê mi kevin.

_Ma bi kêrê çotê tê?

_(Go) Wala xaletê li xafika mi kevê.

_(Go) Naxwa ti bi kêrê çi tê? Go hin qaz û elokê ma hena ti bi kêrê wa tê?

_(Go) Ha, ha ew dermanê min in. Ez ê herim ber va.

Vêca kurik hingî sipehiya xwe şanî wa nadê. Go ê herê ber qaza û eloka. Hespki wa jî hebû. Go ê wî hespi bibê li wa dera. Go ê herê vî rexî herê vî rexî dehlê. Go vêca heyvanê wa jî zehf bû. Go qazik wa jî hebû, kor bû. Go wê qazê haloo hingî li mêrik dimêyizand, sipehî bû qaza ma birçî dima. Axê go xwe ha xwe ya piçûçik got:

Her her bê ma ev zilam qey ev qaza ma lixwû dişkênê, de hera bê ma çi dikê ji wana. Hera wê qazê bêna em ê bûgirênin hema em ê hestûk mestûka (vêca navê wi Keçeloneko danibûn)emê bidin Keçeloneko. Emê qaza xwe bixwûn. Go keçik çû, haloo li kurik di de eyarkê xwe daniya wê dê, wê bergilê suwar bûya halo tura tavêjê. Go heft dila dil ketê. Go heft dila dil ketê Keçelonek.

_Go wala keko, feqirko ji xwer rûniştî ya û qaza ma nediçêriya, birçî dima. Rabû qaza xwû gurandin û anîn. Sê çar roj tê qediya go rokê delîl çûn ji axê ra gotin xûhê ta gihana besa wa bida besa. Ededê wî gûndî jî kê; ê go keça wa gihan dixistin şibakê û dibakirin gûndiyan herekê sewkî dixistin destê wa û kêfava jî kir dihaç sêv nav milê va dixistiin. Delîl ban hildan go:

_Hêê kes neçin deverkê. Hemû xwe biêdilênin, werin. Îro axê ê xwûhê xwe ê bidê. Werin. Go milat giha hev. Kurê qazî hat keçika mezin sêv nav milê wî xist. Go ew giha wî. Go ê miftî hat keça dî nav milê wî xist ew jî giha wî. Go digo êdî gundê reş û dirêj hat. Kûr û nekîr nav milê wa nexist. Go wala kî nehatiya kî nehatiya go Keçeloneko nehatiya. Go herin bakina wî bera zû werê. Çûn bakirin feqîro, ew jî hat. Xwarin dan ber wî keçik sêv nav milî wî xist. Xwe sheyto mehto kir. Go:

Eaûw qey hûn wûlo li serê mi dikin. Go:

_Çê ne bû bêhemd.

Di cara lê xist gotin qey bê himd. Yekî go ma ew jî kurê bavê xweya. Wê lêxistiya wê gihayê. Go rabû li wê dê rûniştin gihan hevdû. Go keçika mezin; ya kurê qazî jina wê na go keko ma tê kû dê bidê min. Ya dî go birayem tê kû dê bidê mi. Herdo dawa heqê xwe kir. Go herekê deverê dan wana.

_Go ya dî go, keko tê kû dê bi de mi.

_Go ma ez ê kû dê bidim ta. Wa ya cihê lîsê eloqa ezê bidima ta. Ma te ti axa nekiriya.

Go keçika ma giriya, Kurik go wera besî me ya. Eleqê ta jê nîna. Bera nedê ma. Go wala feqîra çûn cihê lîsê eloqa, qaza ji xwera edilandin. Êdî di nav malê da ne her do biqedirin. Go rokê go waya axa nexweşa. Şîrê şêr, çêlîkê şêr negihê axê ê bîmrê. Go rabû kurê qazî û kurê miftî barekî panîr û xwarin li keza kirin û berê xwe dan dinya yê, ê derman bînin. Go Keçelonek jî kê bavê wî hafiz ew hungilisk a dabû yê gotû bû hînga safa wî ti badê ê hespkî bayî ê li ber te çêbê. Wekî dî te zivîrand jî ê hespkî ê Kurmanci li ber te çêbê. Kurik ji gûnd derket hungilis ka xwe ba da. Got jina xwe ji kesir nebêjê ez ê herim filan deverê ji war nebêje. Lêxist û çû. Çû giha deverê kê pîrsî:

_Go wala hal û mesela axê ma eva. Go şîrê şêr eyarê şêr îşev negihê ê bîmrê. Go yekî:

_ Her ber wî çemê hana li wê dê şêrek heya zaya. Qela wî ra girtiya. Talikî xwe çêka û li wê dê tîr û kevanê bavêja qêla wî. Bê ser avê go qêla wî go ti bipeqênê wê tîr av vexwê û wî çaxî tê dawa şîrê jê lêkê.

Go wala mîrik çû. Mîrik çû wê derkê. Kozkê ji xwer çê kir û ket Kozkê. Dît kû şêr haq halo qûlipt halo qûlipt kir û nekîr ji wê qêla xwû nikarî bû av vexwê. Tîr û kevane avêt û qêla wî xist go wala qêla wî peqaha. Tîr av wexwar. Wala rabû şêr go:

_ Ti çî kesî, bext ji te ra derkeva. Ti bê çî ez ê bidim a te. Go digo

_Wala çêlîkê şêr û şîrê şêr ji mer lazima axa yê ma nexweşa. Go digo

_Ezê bidim a te lê ti heft dûvîka biqûlibê dengê wî werê min ez ê werim te bixwûm.

Ti dibê hefta ez ê bîsta biqûlibim. Cihê mi dûra.

Go wala anî. Anî kurê qazî û miftî Jî li wê derkê kon vegirtina di rê da.

_Gotin ma ti çî kesî?

_Go wala ez textorim.

_Textorê çî ya?

_Go digo wala şîrê şêr û çêlîyê şêr bimirna tedî dermanin.

_ (Go herdoka li hev nerin û)Go wala em jî wî dermanî digerin. Ka heqê ta çî ya?

_Go heqê mi ne ti tiştêka ha hungiliskê, wê ya ha ez ê li qûna we xim. Şalwarê xwe jê kin û ez ê hungiliskê li qûna we xim ez ê derman bidima we. Yekî go na edî go:

_Belê lawo belê. Ma ê kî werê li qûna ma meyzênê. Bera xwezûrê ma rehet bê besa

Wer hasil wulo kir. Herkê hungiliskê li qûna wa xist. Ê qenc ji xwer hiştê pis dana wa. Anîn dan axê axa yekcar pê nexweş ket. Keçeloneko şîr xist qedehkê, da jina xwe go biba ji birayê xwera. Vexwê. Go wala bir devê dêrî go digo:

_Keçê ma te çî ji mir aniya zelqê qaza te ji mir aniya.

Go keçik giriya. Go qedehkê xwe wegerand. Go jina wî go :

_Eeaûw qey ti wûlo erza xelkê dişkênê. Wexwa hema jehr jî bê tê wexwê. Belkî ti pê rehet bê.

Go wala wexwar. Go:

_Go ayy bê çîqa xweş bû. Te ji kû aniya hinî dî bêna.

Werhasil axa rehet bû. Go di heftî tê derbas nebû axa dîsa nexweş ket. Go vê carê çî lazima, go hinara hind û yemenê lazima. Go rabû dîsa kurik berê xwe da hinara hind û yemenê. Go êdî dida xwarin û marin ji xwer birin, kohn vedigirtin û riya qûnax qûnax û diçûn. Go wala kurik lê xist û çû. Tedi hungiliska xwe ba dida hespê bayî li ber disekinî û dûr diçû. Go giha gundekî pirsî go:

_Ma ev derman li van dera nîna? Go:

_Belê wala heya. Lê ti karibê bibê.

Go rabû çû. Devê kehnikê hinarekî. Go çû serê darê. Go ya pîr kê bû. Sê keçê pîrê hebû. Pîrê hevîr dikir. Qey pîrê cinî bû. Got keça xwe ya mezin go:

_Qirikê wala bêhna insana ez xwarim. Heqa bê kî ser hinara ma ya.

Go keçik çû. Dêy gêncek ser wî ya. Hingî sipehî bû go keçik ne bi dilekî bi heft dila dil ketyê. Go kûro hinarê hûr hûr binêqena. E gir bi kêr nayê. Çû go:

_Yadê wala kes nîna. Go:

_Her ti darawa dikê. Got yê di go ti hera. Êdî jî çû go:

_Wala yadê kes nîna.

Ew jî wûlo hej jê kir. Got ya piçûçik. Çû, go:

Kuro besa ez mama diya mi bê ê te bixeniqênê. Ê hûr hûr binêqê.

Go kurik anî. Dîsa her do bacanaqê wîna li deverkê rûniştina û bin konê dîsa goşin:

_(Go digo) Ti çi kesî?

_(Go digo) Ez textorim.

_(Go digo) Ma çi bi ter heya?

_(Go digo) Hinara hind û yemenê na.

_(Go digo) Ma ti nafroşê?

_(Go digo) Çawa ez nafroşim.

Rabû ê gir gir dan wana. Ê hûr ji xwûr hiştin.

_(Go digo) Ka heqê te çi ya?

_(Go digo) Heqê mi ev hungilîska. Ez ê wê hungilîskê li qûna we xim û ez ê derman bidî ma we.

Disa her dû hevdû çikê kirin. Êdî go em elimîna. Em ê ve ji kê wûlo derbaskin. Go herekî hungilîskê li qûna wa xist û derman da wana. Go kurîk anî da xwezûrê xwe dîsa rehet bû. Werhasil demik têt çû. Go carê li dora axê şer derket. Go gundik dî haţibû gundê wa û herp bikin. Go rabû li hevdû xistin. Go herdo kî di erê wa jî herp dikir lê Keçelonek got jina xwe:

_Meyzê ez ê herim. Herbê bikim. Hespê mi sipiya. Cilê mi sipiya. Meyzê herdo xwûhê ta ê bêjê ev ê ha sûwarê me ya ev ê ha suwarê me ya ti nebêjî. Go ti bêjî ez ê bela xwe bibînim.

Dibê na na ez nabêjim. Herdo xwûhê wêna haţin tihêla wêna û veca kurîk ketiya nav şerdikê. Kurîk şer dikê. Herdo jiniş haţin dibêjin ev suwarê ha ya me ya. Şer dikê û birayê ma xelas dikê. Yadî jî wûlo digot. Hingî gotin keçik qeherî. Dibê:

_Wala hûn bipeqin. Ew ê ha suwarê min a. Ê cilî sipî û hespê sipî. Kurîk ket.

Destê wî şikest. Go axa desmala xwe da. Go lê bipêça. Axa zanê kîjan herbê dikê. Go rabû pişti şer gûnd ava bû. Safî bû. Te dît hemû haţin mala xwe. Kurê qazî, doşeka wa du metra bilinda, her do tihêla hevin, wesfê xwe didin, me şşer kiriya. Ê di jî wûlo dibêjê. Go jiniş jî got merê xwa:

Heyra îşev em neçin çika bira yê mi qiyma mi nayê. Em jî kê em ê herin nav mehvanê bira yê mi. Go rabû zilêm go heyra em naçin em ê li malişka xwe na. Go naa em ê herin. Rabûn çûn. Go her do bacanaqê wî wesfê xwe didin. Axa dibê qet nebêjin. Ê go mi desmala xwe daye ew herp dikir. Qet derewa nekin. Go rabû Keçelonek çû. Ew go wera ew go wera wi ji kê go:

_Ez ê çi werim. Weyê şer kiriya. Mi tiştêk nekiriya. Ez nayêm. Go rabû Keçelonek çû eyarkê xwe noqa enterikê xist, enterik şikest. Şewq û şemala wî da waqa deş. Go digo:

_ Axê digo mêh vî şer dîkir, zavê mi vîna. Piştire digo:

_ Meyzêna ew ilacê sixte tani ew ez bûm ne textor bû. Mi dida we û herekê sefêk jî wêna mi li qûna wa dixist.

_ Axê go ka şalwarê xwa jê kin. Go em ê çawa jêkin go jê kin wala jê kîrin. Jê kîrin meyzandin herkê dema hungiliskê li wa ya. Go rabû axê serê herdoka jê kîr û jina wa kîr ceriya Keçelonek û serê we sax û çîrokê ma xelas....

1.3. Bizin û Gur

Go mihik û bizinik hebû ji pêz ma bû. Go ji pêz ma bû. Go digo mêhê go bizinê go digo:

_ Ka emê wî cewlikî mîz kin bê kî ser vê bê, ew ê bigihê pêz

Rabû pêşi bizin mîz kîr û mehê ser mîz kîr û dagirt mêh çû. Bizin ma. Bizin ma wê derê. Werhasil dibê qey awis bû. Li wê dê za. Di kahrik anî. Navê yeke kîr şengê yê di kîre pengê. Go wê, wana texê qûlkê ê herê çeriyê. Êvara şîr bidê va. Heza piçkî mezin go:

_ Meyzêna dêrî venekin. Ne go ez bim jî kesî kîr venekin.

Rabû gur ha. Gur ji daya pey û dimeyzê ji wir derdikevê. Gur çû devê dêrî dibê:

_ Dêrî vekin ez ha. Go digo ti ne diya me ya go digo:

_ Go belê, ez diya we ma. Şîr ketiya guhanê dêrî vekin ez ha. Rabû wa çîqa go dêrî vekirin. Rabû xwe çin kîr herdoka, herdoka xwar. Go rabû bizin ha meyzand ne kahrik ne tiştik. Go çû ser banê rovî, rovî go:

_ Çi gûrm gûrma te ya. Go:

_ Te xwariya şenga mi te xwariya penga mi wera qal û cenga mi.

_ Nexwarima şenga te, nexwarima penga te ez nayê qal û cenga te.

Go çû serê banê sê ew jî go mi nexwariya. Çû banê gur kîre gûrm gûrm. Gur go çiya

_ Te xwariya şenga mi te xwariya penga mi wera qal û cenga mi.

_ Go be. Mi xwariya şenga te mi xwariya penga te ez ê werim qal û cenga te.

Go rabû gûr çû cem diranker. Dirançî ji dêvla dirana dendikê kundira xist devê wî. Bizin jî çû cem edad sitirêhê xwe tîj kîr. Ha. Hingê gur go heem diran hemû bela bû. Bizin jî ha serê xwe bin hûrî wî xist û gur mir. Zarokê xwe ji nava gur derxist û hûn sax.

1.4. Zênka Zêra

Zênka Zêra hebû. Go digo xwûha heft bira bû. Veca digo heval mevalê wê jê diqeherin. Rokê gotin emê çikê jêr bikin. Rabû gotin Zênka Zêra em ê herin piştîyê. Go çû gotê diya xwû, diya wi go:

_ Lawo ti neelimiya. Dev ji xelqê berda henekê xwe bite dikin. Go:

_ Yadê ez ê herim bi hevalê xwû hema ez ê bêhna xwe berdim, hevalê xwe ra filan.

Rabû çûn. Keçik piştîyê xwe rast kir. Zênka Zêra go xewa mi tê, nazik bû. Raza, keçik gotin em ê wê li wir bihêlin. Rabû keçikê di xew de hiştin û çûn. Carkî rabû di nav serê çiyakî reş û tarid ya. Go:

_ Wa yadê wa yadê yadê jî kû. Hirç ha go hê hê. Go wala ti ne diya minî. Ti yeqa qûn mezinî.

Di cara sê cara wûlo got feqîrê tirsiya ma ê herê kû dê. Go rabû hirç wî bir û xist qûlkê. Diya wî jî diçê hevalê bêjê:

_ Keçê kanî keça mi ne biwer bû. Kanî we bir. Go wala jinjalê berî me ha. Barê xwe kir û ha. Keçê wala nehatiya malê. Geriya negeriya nedît. Di sal sê sal te çû zarokê wê çê bûn hirç nêr bû. Hirç ji ê wê diqûlêxê ê hêrê neqirê. Sibaha diçû. Kevirkê, rizdek kê mezin devê qûlikê asê dikir û diçû. Go rokê şivanê mala bavê wê diwir çû. _

Go ho şivano ho şivano şivanê mala bavê min i.Devê bilûra te hesinî. Ez Zênka Zêra ma xwûha heft bira ma girtika gûr û hirça ma.

Şivan li dorê xwe meyizand tiştêk nedît. Rokê qolya xwe xist sûkra kahrikî. Diçin gund diya wê dibinê dibêjê şivan ev ji kû hatiya. Şivan dibê hal û mesela wûloye wala ez lê geriyam mi nedît. Diçin digerin keçikê ddibînin. Lê nikarin devê qûlikê vekin. Keçik dibêjê zarokê xwe dêrî vedikin û zarokê xwe ji li wir dihêle û diçin. Hirç tê dibê ka diya wa. Go digo xalo yadê bir, xalo yadê bir wûlo zanî bû. Hirç qehfê yekî li wê dîwarî xist ê di li wê dîwarî xist û serê wa sax.

BEŞA DUYEM

2.TESBÎTKİRİNA HEJMAR Û RÊJEYA TÎPÊN BİKİRP Û BÊKİRP YA GİŞTÎ


2.1. Tabloya Gîştî

Tablo1: Tabloya Gîştî Ya Bikaranîna Tîpan

TÎP	TEVDE	BÊKİRP(HÎŞK)	BİKİRP(NERM)
A	1824	1813	11
B	659		
C	82		
Ç	316	100	126
D	850		
E	1782	1751	32
Ê	1486		
F	49		
G	513		
H	526	421	105
I	2001		
Î	507		
J	270		
K	860	216	644
L	456		
M	598		
N	895		
O	496		
P	127	35	92
Q	121		
R	1082	665	417
S	275		
Ş	142		
T	494	86	408
U	136		
Û	499		
V	277		
W	658		
X	320	285	35
Y	381		
Z	306		


2.2. Grafika Alfabetîk

Grafîk1: Grafîka Hejmar û Jisedîtiya Tîpan Ya Alfabetîk Ya Vê Xebatê




2.3. Grafika Gıŝtî Lî Gorî Rêze

Grafik 2: Grafika Li Gorî Bikaranînê Rêz Kirina Hejmar û Jisedîtiya Tîpan. Ya Vê Xebatê




2.4. Grafika Tîpên BîkîrP – 1

Grafîk 3: Grafîka Rêjeya Tîpên BîkîrP Ya Giştî Ya Vê Xebatê.1




2.5. Grafika Tîpên BêkîrP-2

Grafîk 4: Grafîka Rêjeya Tîpên BêkîrP Ya Giştî Ya Vê Xebatê.2




2.6. Grafika Tîpên Bıkırp – Bêkırp 1

Grafik 5: Grafika Rêjeya Tîpên Bıkırp û Bêkırp Ya Giştî Ya Vê Xebatê.1




2.7. Grafika Tîpên Bıkırp – Bêkırp 2

Grafik 6: Grafika Rêjeya Tîpên Bıkırp û Bêkırp Ya Giştî Ya Vê Xebatê.2



2.8. Grafika Tîpên Bîdeng-Bêdeng Ya Vê Xebatê

Grafik 7: Grafika Rêjeya Tîpên Dengdêr û Dengdar Ya Giştî Ya Vê Xebatê.




2.9. Nirxandina Giştî

- Di vê xebatê de li gorî tablo û grafîkên giştî encamên giştî;
- Bidenga herî zêde hatiye bikaranîn(2001 - %10,5) “I” ye.
- Bidenga herî kêr hatiye bikaranîn(136 - %0,7) “U” ye.
- Bêdenga herî zêde hatiye bikaranîn(1082 - %5,6) “R” ye.
- Bêdenga herî kêr hatiye bikaranîn(49 - % 0,2) “F” ye.
- Di nav neh tîpan de tenê “K”, “R” û “T” yê de hejmar û rêjeya awayê bikirp yê awayê bêkirp zêdetir in.
 - Di nav neh tîpan de herî zêde(2001) tîpa “I” yê hatiye bikaranîn.
 - Di nav neh tîpan de herî kêr(127) tîpa “P” yê hatiye bikaranîn. Rêjeya rewşa vê tîpê ya bilêvkirina bêkirp %28 e. Rêjeya rewşa bilêvkirina bikirp jî %72 ye
 - Serê bêjeyan de “U” û “Û” qet nehatine bikaranîn.
 - Dengdêra “U” yê bi giştî li gor dengdêra gelek hindik hatiye bikaranîn sedem ewe ku herêma Nisêbînê gihaneka “U” yê pir kêr tê bikaranîn.
 - Bi tevahî 18988 tîp hatine bikaranîn ji vana 8731 (%45,9) hev bideng in, 10257 (% 53,7) hev bêdeng in.
 - Li ser hinek hejmar û rêjeyan de bandora motîf û lehengên çîroka hene. Wek mînak mirov dikare bêje ku çîroka de gelek cara peyva “pirek” û “pir” derbas dibin. Mirov dikare bêje ku vê yekê bandor li ser encama tîpa “P” yê kiriye bi taybetî jî li ser zêde bûna hejmar û rêjeya bikirp bûna li vê tîpê bandor kiriye.
 - Li çîroka bi navê “ Keçelonek” de peyvên erebî hene. Çîroka “Bizin û Gur” de em karin bêjin peyvên erebî nine. Çîroka “teyrê şîreta” de peyvên aksan heye. Minak heziniye, eleka w.v. “H”(ح) û “E”(ع) de verina de hatiye bikar anin.
 - Sedema herî zêde bikaranîna “D,G” yatiye ê ya serê peyvan de bandora wî tiştîye ku metnên xebatê çîrok in. Çima ku çîrokan de gelek cara peyva “dibêje” û versiyonên wê(go, digo, dibê, gotyê) derbas dibe.

BEŞA SÊYEM


3. HEVBERÎ KİRÎN A VÊ XEBATÊ JÎ XEBATÊN DIN RE (XEBATA CELADET BEDİR-XAN Ê BARAN RIZGAR RE)

3.1. Grafîka Hejmara Xebata Celadet Bedîrxan¹



¹ Emîr Celadet Bedîr Xan & Roger Lescot, Kûrtçe Dilbilgisi (Kurmancî) Doz Yayınları, 1997, r.50


3.2. Grafika Tîpan Ya Li Gorî Rêzkırına Jîsedîtiyê Ya Xebata Celadet Bedirxan²



² Emîr Celadet Bedir Xan & Roger Lescot, Kûrtçe Dilbilgisi (Kurmancî) Doz Yayınları, 1997, r.50

3.3. Grafîka Tîpan Ya Li Gorî Rêzkırına Jisedîtyê Ya Xebata Baran Rîzgar

Grafîk 8: Hejmar û Rêjeya Tîpan A Giştî Ya Xebata Baran Rizga¹ Baran Rîzgar, Uygulamalı Kûrtçe Derslerî/Dersên Kurdî, Lithosphere Printing Cooperative, 1993, R.392



3.4. Tabloya Hevberîkirina Her Sê Xebata

Tablo 2: Danberhev Kirina Hejmar û Rêjeya Tîpên Her Sê Xebata.

	EV XEBAT		XEBATA BARAN RÎZGAR		XEBATA CELADET BEDIRXAN	
	HÊJMAR	JISEDÎTÎ	HÊJMAR	JISEDÎTÎ	HÊJMAR	JISEDÎTÎ
A	1824	% 9,6	5882	% 8,1	1500	% 8,5
B	659	% 3,4	3180	% 4,4	650	% 3,7
C	82	% 0,4	661	% 0,9	120	% 0,7
Ç	316	% 1,6	825	% 1,1	150	% 0,8
D	850	% 4,4	2744	% 3,8	840	% 4,8
E	1782	% 9,3	8510	% 11,7	2200	% 12,4
Ê	1486	% 7,8	1577	% 2,2	1000	% 5,7
F	49	% 0,2	677	% 0,9	150	% 0,8
G	513	% 2,7	1426	% 2	200	% 1,1
H	526	% 2,7	1862	% 2,6	350	% 2
I	2001	%10,5	6190	% 8,9	1800	% 10,2
î	507	% 2,6	3855	% 5,3	700	% 4
J	270	% 1,4	620	% 0,9	300	% 1,7
K	860	% 4,5	2590	% 3,6	650	% 3,7
L	456	% 2,4	2237	% 3,1	450	% 2,5
M	598	% 3,1	1888	% 2,6	550	% 3,1
N	895	% 4,7	5806	% 8	1300	% 7,4
O	496	% 2,6	1316	% 1,8	400	% 2,3
P	127	% 0,6	1140	% 1,6	120	% 0,7
Q	121	% 0,6	1002	% 1,4	140	% 0,8
R	1082	% 5,6	5380	% 7,4	1100	% 6,2
S	275	% 1,4	1914	% 2,6	340	% 1,9
Ş	142	% 0,7	1443	% 2	160	% 0,9
T	494	% 2,6	2459	% 3,4	400	% 2,3
U	136	% 0,7	797	% 1,1	120	% 0,2
Û	499	% 2,6	904	% 1,2	450	% 2,5
V	277	% 1,4	1363	% 1,9	500	% 2,8
W	658	% 3,4	1153	% 1,6	350	% 2
X	320	% 1,6	1106	% 1,5	340	% 1,9
Y	381	% 2	731	% 1	200	% 1,1
Z	306	% 1,6	1283	% 1,8	150	% 0,8
	18988	% 100	72521	% 100	17680	% 100

3.5. Tabloya Hevberî Kirina Tîpên Bıkırp – Bêkırp Avê Xebatê û Xebata Baran Rızgar³

Tablo 3: Hevberî Kirina Hejmar û Rêjeya Tîpên Du Nuans Yê Vê Xebatê û Ya Baran Rızgar

	EV XEBAT		XEBATA RIZGAR BARAN		EV XEBAT		XEBATA RIZGAR BARAN	
	BÊKIR P	JISEDÎT Î	BÊKIR P	JISEDÎT Î	BIKIR P	JISEDÎT Î	BIKIR P	JISEDÎT Î
Ç	190	% 60,1	475	% 57,6	126	% 39,9	350	% 42,4
E	1751	% 98,2	8394	% 98,6	32	% 1,8	116	% 1,4
H	421	% 80	1476	% 79,3	105	% 20	386	% 20,7
K	216	% 25,1	820	% 31,7	644	% 74,9	1770	% 68,3
P	35	% 27,5	723	% 63,4	92	% 72,5	417	% 36,6
R	665	% 61,4	4036	% 75	417	% 38,6	1344	% 25
T	86	% 17,4	1799	% 73,2	408	% 82,6	660	% 26,8
X	285	% 89	996	% 90,1	35	% 11	110	% 9,9
	5372		18719		1870		5153	

3.6. Nırxandina Hevberî Kirin A Her Sê Xebat

• Dema ku bikaranîna giştî ya peyva em binhêrin ji danberhev kirina her sê xebata xalên ku pêş de ber bi çav dikevin evina ne:

• Di xebata Celadet Bedirxan de bi giştî tîpên ku herî zêde hatine bikaranîn: E (% 12,4), I (% 12,4), A (% 8,5), N (% 7.4) ne. Yê ku herî kêma hatine bikaranîn: U (% 0,7), P (% 0,7), C (% 0,7) û Q (% 0,8) ne.

- Di xebata Baran Rizgar de bi giştî tîpên ku herî zêde hatine bikaranîn: E (11,7), I (% 8,5), A (%8,1) û N (%8,0) ne. Yê ku herî kêr hatine bikaranîn: J (%0,9), C (% 0,9), F (% 0,9) û Y (%1) ne.

- Di vê xebatê de tîpên ku herî zêde hatine bikaranîn: I (% 10,5), A (% 9,6), E (% 9,3), Ê (% 7,8) ne. Yê ku herî kêr hatine bikaranîn: F (% 0,2), C (%0,4), Q (% 0,6) û P (% 0,6) ne.

- Vexta ku em tîpên bikirp û bêkirp dimeyzênin li gorî xebata Baran RIZGAR sedeniyên van nêzikî hevdune. Minak ê vî xebatî bêkirp E(% 98,2),X(% 89),H(% 80) ê Baran RIZGAR E(% 98),X(% 90,1),H(% 79,3) nêzikî hevdune.

ENCAM

Ev xebat li ser 18988 tîpan hatiye kirin û bi giştî herî tîpa zêde 'I' (2001 - % 10,1) hatiye bikaranîn. Herî kêr (49 - % 0,2) tîpa 'F' yê ber çav dikeve.

Xebata Celadet Bedirxan de bi giştî herî zêde (2200 - % 12,4) 'E' hatiye bikaranîn. Herî kêr (120 - % 0,7) 'U', 'P', 'C' hatine bikaranîn.

Xebata Baran Rizgar de herî zêde (8510 - % 11,7) 'E' hatiye bikaranîn. Herî kêr (620 - % 0,9) tîpa 'J' yê ber çav dikeve.

Her wiha dîsa vê xebatê de bi awayê çîrok bi çîrok jî zêde bûna 'I' yê ber çav dikeve. Her çar çîrokan de jî herî zêde 'I' hatiye bikaranîn. Çîrokan de herî kêr 'F', hatiye bikar anin.

'I' bi giştî û biîstisna herî zêde hatiye bi kar anîn lê serê peyvan de bikaranîna wê asayî ye. Ya herî zêde nîne.

'R' serê peyvan de her dem girover hatiye bikaranîn. P,Ç,T,K jî dawîya peyvan de bi piranî bikirp in.

Bi awayê giştî tîpên bikirp de tenê 'T', 'R' û 'K' yê de hejmar û rêjeya bikirpa yê bêkirp zêdetir in. (bnr. , g. 1.4,1.5,1.6)

Rêjeya tîpên bikirp (1870) di nava hemû tîpan de (18988) jî % 9,8 û di nava bêkirpan de jî % 28,2 ye

ÇAVKANÎ

Bedirxan, Emîr Celadet & Lescot, Roger: Kürtçe Dilbilgisi (Kurmancî), Doz Yayınları, 4. Baskı, İstanbul, Ocak 1997.

Rizgar, Baran: Uygulamalı Kürtçe Dersleri/Dersên Kurdî, Lithosphere Printing Cooperative, London, 1993.

Kesên Çavkanî: Nav û Paşnav	: Atiye AXIRMAN
Çîroka Ku Vegotiye	: Keçelonek, Bizin û Gur, Zênka Zêra (20 deqêqe)
Cih û Dîroka Jidayîkbûnê	: Dalîn (Midyad- 1975)
Asta Perwerdehiyê	: Perwerde nedîtiye
Navnîşan	: Nisebîn /gundê Serê Avê
Çavkaniya wê	: Malbat
Dever	: Nisebîn
Dîrok	: 2013
Nav û paşnavê Berhevkar	: Îpek DERÎN
Nav û Paşnav	: Remziya AXIRMAN
Çîrokên Ku Vegotiye	: Teyrê Şîreta
Cih û Dîroka Jidayîkbûnê	: Qesirkê(gundê Nisêbîn) - 1973
Asta Perwerdehiyê	: Perwerde nedîtiye.
Navnîşan	: Nisebîn / gundê Serê Avê
Çavkaniya wê	: Dayika wê
Dever	: Gundê Serê Avê
Dîrok	: 2013
Nav û paşnavê Berhevkar	: Latîfa AXIRMAN, Cemîle AXIRMAN

Di sala 1987 an de li Dîyarbekir ji dayik bû. Li Wanê di sala 2010 an de beşa wêjeya edebiyata Tirkî xelas kir . Niha ji li zaningeha Artuklu yê ser zimanê Kurdî mastira bê tez dixwine(2013)....

PÊVEK

1. CD

a) Tez

b) Qeyda deng a çîrokên di metnên xebatê.

T.C
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
TÜRKİYEDE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

NUSAYBİN(MARDİN) AĞZINDA SESLERİN KULLANIM SIKLIĞI

İpek DERİN
12721157

Danışman
Öğr. Gör. Mikail BÜLBÜL

Mardin - 2013